




# Rênîşana ji bo dêûbavan

– eger bûyereke koronavîrusa nû/COVID-19 li saziyên kreşan, dibistanan û li saziyên din ên ji bo zarok û mirovên ciwan hat erêkirin

31.07.2020



## **Çi dibe eger bûyereke koronavîrusa nû/COVID-19 li saziya kreşê/dibistan û hwd. a zarokê min hat erêkirin?**

Eger testa zarokê ji bo koronavîrusa nû/Covid-19ê erênî derkeve, Rayedariya Tenduristiyê ya Danîmarkî pêşniyar dike ku dêûbavên zarokê saziya kreşê/dibistan û hwd. a zarokê agahdar bike.

Eger saziya kreşê/dibistan û hwd. a zarokê we hat agahdarkirin ku zarokê bi koronavîrusa nû enfekte bûye, tê pêşniyarkirin ku rêveberî hemû xebatkaran û dêûbavan agahdar bike – bêyî dabînkirina agahiyên derbarê nasnameya zarokê enfektebûyî – bi rêya şandina peyamekê, bi emailê, li ser portala navxweyî ya dêûbavan an jî tiştêk wek wan.

Her wisa tê pêşniyarkirin ku rêveberî bibe alîkar ji bo şopandina zarokên din/mirovên ciwan/xebatkaran ku wek têkiliyên nêzik ê zarokê enfektebûyî tînin hesabandin.

Eger rêveberiya saziya kreşê/dibistanê kifşe bike ku zarokê we bi kesekî enfektebûyî re bûye têkiliyê nêzik, ew ê rasterast bi we re bikevin têkiliyê. Dibe ku hûn lêgerîneke telefonê jî wergirin ji Coronaopsoring (Şopandina Koronayê), daîreya Rayedariya Danîmarkî ya Ewlehiya Nexweşan, ku ji bo karê şopandina têkiliyê bibe alîkar.

Bi tenê bi dêûbavên zarokên ku wek têkiliyên nêzik ê kesê enfektebûyî tînin hesabandin re bi awayekî rasterast têkilî tê çêkirin.

Têkiliyên nêzik wek kesên ku hûn bi wan re di demeke diyar de bûne xwedî têkiliya nêzik tînin terifkirin. Têkiliyên nêzik ên zarokan zarokên din an jî mezinên li saziyên wek kreş, dibistan û kulûbên demên vala digire nav xwe ku têkiliya wan a fizîkî ya rasterast bi zarokê çêbûye, an jî zarokên ku di nav mesafeyêke kêmtirî yek metreyê de bi hev re bi qasî 15 deqeyan leyîstine.

## **Divê hûn çî bikin eger zarokê we bûye têkiliyê nêzik ê kesekî enfektebûyî?**

Wek rêgez, zarok jî divê heman rênîşanan bişopînin wek mezinan, wek mînak divê zarok li malê bê hiştin û bê testkirin. Di sa jî, dibe ku hûn nexwazin zarokên jêr 12 salî test bikin ji ber ku dibe ew prosedurê acizker bibinin.

Rênişana me bixwînin ya *Çi bikin eger hûn bûne têkiliyê nêzik ê kesek wisa ku testa wi/wê ji bo koronavîrusa nû erêni derketibe.*

### **Divê ez çi bikim eger zarokê min semptomê COVID-19ê nişan bide?**

Zarok divê bi giştî heman rênişanan bişopînin wek mezinan. Zarokê li mal bihêlin û têkilî bi bijîşkê xwe çêkin ji bo nirxandinekê û belkû jî ji bo standina sewqê ji bo testkirinê.

Rênişana me bixwînin ya *Çi bikin eger semptomên we yên COVID-19 hebin.*

### **Divê ez çi bikim eger testa zarokê min erêni be?**

Zarok divê bi giştî heman rênişanan bişopînin wek mezinan. Eger testa zarokê we ji bo koronavîrusa nû erêni derkeve, hûn ê ji hêla Coronaopsporing (Şopandina Koronayê) ve, daîreya Rayedariya Danîmarkî ya Ewlehiya Nexweşan, bèn lêgerandin. Ew dikarin bibin alîkar ji bo şopandina têkiliyên nêzik ên zarokê we. Hûn dikarin bi xwe jî têkilî bi Coronaopsporing (Şopandina Koronayê) çêbikin bi jimareya telefonê ya 32 32 05 11.

Em pêşniyar dikin ku hûn li saziya/dibistana ku zarokê we xudan dike bigerin da ku dêûbavên zarokên din ên ku dibe tûşî enfeksiyonê bûne agahdar bin, û lewre zarokên din bikarin bèn testkirin.

Rênişana me bixwînin ya *Çi bikin eger testa we ya ji bo koronavîrusa nû erêni be.*

Eger çi pirsên we hebin derbarê nexweşiya zarokê we, ji kerema xwe **li bijîşkê xwe bigerin.**

Eger çi pirsên we hebin derbarê şopandinê têkiliyê an jî testkirinê, ji kerema xwe li **Coronaopsporing (Şopandina Koronayê)** bigerin bi jimareya **telefonê** ya **3232 0511.**

Eger pirsên we yên din hebin, hûn dikarin li xeta **hikumeta Danîmarkî** bigerin bi **jimareya 702002 33.**

# Agahiyên girîng derbarê koronavîrusa nû/COVID-19

COVID-19 navê wê nexweşiyê ye ku koronavîrusa nû bûye sedem.

## Enfeksiyon



Ji bo astengkirina belavbûna enfeksiyonê, girîng e ku mirov bizane koronavîrusa nû çawa derbas dibe.

Derbasbûna bi rêya têkiliyê: Derbasbûna bi rêya destlêdana rûxar an jî tiştan ku ji hêla mirovên enfektebûyî hatine bikaranîn, û piştê jî destlêdana bi bêvil, çav an jî devê xwe. Rîska derbasbûna bi têkiliyê dikare bê kêmkirin bi rêya pêkanîna paqijiya baş a dest û misogerkirina paqijkirina dest a timamî.

Derbasbûna bi dilopikê: Derbasbûna mirov-bi-mirov a bi rêya dilopikên ku ji hewayê (rêka bênhildanê) dirije dema ku mirovekî enfektebûyî dikuxe, dipişke hwd. Dilopik di nav yek û du metreyan de dikevin erdê, û lewma rîska derbasbûna bi dilopikê bi rêya mesafeya civakî kêmkirî dibe.




## Semptom

Semptomên tipîk ên COVID-19ê:

Kuxika hişk	Gewrî êş
Germiya laş a bilind	Serêş
Zehmetiya bênhildanê	Êşa masûlkeyê

## Çawa belavbûna enfeksiyonê bê astengkirin



Tiştên herî girîng ji bo pêkanîna li gor rêza pêşekiyê:

1. Cudakirina kesên ku semptoman nîşan didin û şopandina têkildarên wan ên nêzik
2. Pêkanîna paqijiya baş ya ku girîngiyê dide ser rêz û rêzikên kuxandinê (paqijiya bênhildanê), paqijiya dest û şunwarên têkiliyê
3. Mesafeya civakî ya ku girîngiyê dide mesafeyê, frekansê, mawe û astengiyên

Eger we nekarî yek ji wan pêşniyaran binin cih, misoger bikin ku hûn yên din binin cih.